
Hepatît A



> Hepatît A vîrûseke têger e û bi rêya av û xwarinê têdigere
> Kesên Hepatît A pê re heye dikarin kesên din jî têbigerînin
> Derzî/aşî parastina herî baş e




Hepatît A dibe sedema îltîhaba kezebê
Kesên ku hepatît A pêre heyê zikê wan dêşe, laş germ dibe, virik jê diçe û bi piranî xwe westî û nexweş dibînin. Hinek ji wan bi nexweşiya zerikê jî dikevin ango çêrmê wan û spîkê çavên wan zer dibin.



Derzî/aşî diparêze
Derzî/aşî asayî ji sala yêkê de tê dayîn. Derziya pêşî parastina salekê dike. Ji derziya duyemîn bi şunde meriv heya 20 salan jî parastî dimîne.

Hepatît A li gelek cîhên cîhanê tê dîtin
Ji bo kesên ku ber bi van cîhên ku hepatît A lê heye derdikevin geştê derzîlêdan/aşî tê tawsiye kirin. Tu dikarî derzî/aşî li gelek navendên lênêrînê an jî servîsên derzîlêdanê/aşiyê li xwe bixî.



VÄSTRA GÖTALANDSREGIONEN